

Berhevkirinî

Berferehbûna Dewleta Îslamî (DAÎŞ) li Iraq û Sûriyê bînpêkirinên gelemperî yên tirsnak li pey xwe anîn. Wê grûpê bi awayekî nepenî, lê bi tundiyeka mezin karên binçavkirin û revandinê yên berfereh encam dan. Wê bi hezaran kes ji mal û otombîlên wan û ji ser xalên pişkinînê revandin, ku piştî windayî man. Tevî ku hejmara giştî ya kesên windayî nehatiye piştrastkirin, lê Tora Sûrî ya Mafê Mirovan ragihand ku, bêhtir ji 8143 dosyeyên kesên windayî li cem wan hene, ku berê DAÎŞê ew girtibûn.

Ev rapor balê dikişîne ser 27 haletên girêdayî kesan an jî grûpên ku ji aliyê DAÎŞê ve hatibûn girtin. Zaniyarên dawî yên ku li ser wan haletan hatibûn bihîstin ew bûn ku beriya têkçûna leşkerî ya DAÎŞê di zindanên wê grûpê de bûn. Ev rapor herwiha, revandin û windabûna çalakvan û karmendên di warê mirovahî de, rojnamevan, şervanên li dijî DAÎŞê (hikûmetê û komên dijberî hikûmetê) û şênîyan, belge dike. Di hin haletên din de, endamên malbatê şahid bûn li ser binçavkirina DAÎŞê ji kesûkarên wan re, di hin haletên din de, kesên ku berê hatibûn binçavkirin, behsa dîtina hin kesên windayî li navendên binçavkirinê yên DAÎŞê dikin.

Nimûneyên cuda ji van hevpeyvînan derdikevin. DAÎŞê ew kes armanc digirtin, ku weke astengî li ser berferehbûna xwe didîtin yan jî li dijî ferman û hukmên wê derdiketin. Ev yek jî gelek zelal bû di dema windabûna çalakvanan li Reqayê di sala 2013an de, dema ku DAÎŞê xwe amade dikir ji bo ku dest deyne li ser wî bajêrî. Revandin û windabûna wan çalakvanan tirs û tevliheviyeke mezin belav kir û dengên dijber ji holê rakirin, herwiha bûn weke îbret û mînakê ji bo wan kesên ku dixawzin li dijî wê derkevin. DAÎŞê herwiha rojnamevan û herkesê ku gumana rexnegirtinê li kar û kiryarên xîlafetê ji civaka derve re li ser wan hebû, armanc girtin.

Kesûkarên ku xwe digihandin berpîrsên DAÎŞê û serdana navendên binçavkirinê dikirin, daku pîrsa kesûkarên xwe yên girtî bikin, bi giştî ti zaniyarî bidest nedixistin, hin caran jî ew kes bi xwe dihatin binçavkirin.

Windabûyên din ew kes bûn ku DAÎŞê ew bi sîxuriyê tometbar dikirin yan jî bi karkirina ligel Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAÎŞê ya bi serkêşiya Amerîkayê, yan ligel hikûmeta Sûriyê, yan jî ligel grûpên bi serkêşiya Kurdan, di nav wan de Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), a ku piraniya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya bi serkêşiya Kurdan di dest de ye, ligel Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD), ku saziyeke sivîl e ji bo karbidestên Kurd li Bakurê-Rojhilatê Sûriyê û baskê wê yê leşkerî; Hêzên Sûriya

Demokratîk (HSD), ku ew jî hevpeymaniyê hêzên navxweyî ya bi serkêşîya Rêveberiya Xweser e, berpîrs bû li ser navçeyên ku berê di destê DAÎŞê de bûn.

Gelek qurbanî di dema êrîşên çekdarî yê DAÎŞê de wînda bûn, bi taybetî di sala 2014an de, dema ku DAÎŞê bi awayekî mezin rûbera di bin destê xwe de berfereh kir. DAÎŞê bi sedan leşkerên Sûrî li pêghên hikûmetê yê nêzîkî Reqayê, û zîlamên Kurd li gundên nêzîkî Kobanê û zîlamîne ji hoza Şiweytat ku li dijî wê grûpê derket, binçav kirin.

Piraniya kesên ku DAÎŞê ew binçav kirin zîlam bûn, lê Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (HRW) çendîn haletên windabûna gelek jinan jî, di nav wan de çalakvanîne xwecihî, belge kirin.

Ligel ku hejmareke berbiçav ji kesên ne Sûrî jî ji aliyê DAÎŞê ve hatin revandin, lê ev rapor balê dikişîne li ser Sûriyên ku wînda bûne, bi mebetsa ronîkirina wê yekê ku êş û azara malbatan a ji ber nebûna bersivan, sînorê neteweyî û girêdana siyasî û etnîkî derbas kiriye, û êdî bûye cihê nerazîbûnê li ser asta welêt.

DAÎŞê çî li wan kesan kir piştî ku ew girtin û revandin? Di hin haletan de DAÎŞê endamên xwe bi kurtî film dikirin di dema ku kesên girtî serjê dikirin. Di hin haletên din de, pêgehên ku DAÎŞê weke navendên binçavkirinê bikar dianîn, yan ji aliyê hevpeymaniya bi serkêşîya Amerîkayê û yan jî ji aliyê hevpeymaniya Sûrî-Rûsî ve dihatin bombebaran kirin. Di encamê de piraniya wan kesên binçavkirî dihatin kuştin, ji bilî hejmareke kêm ji kesên ku karîna di wê tevlihevî û bêserûberiyê de birevin. Derbarê hezaran kesên ku ji aliyê DAÎŞê ve hatine windakirin de, heta niha cih û çarenivîsa wan nediyar e.

Malbatên kesên wînda yê ku bi HRW re axivîn, gotin ku wan hêvî dikir ku têkçûna li ser erdê ya DAÎŞê bibe sedema wergirtina agahiyan bi awayekî bilez li ser hezkiriyên xwe. Lê belê derengketinên li pey hev û nebûna vîna siyasî ya berçav û eşkere, kelem û astengiyên mezin li pêşîya wan danîn.

Tiştê ku pîrs aloztir kir, di Cotmeha 2019an de, Tirkiyê û komên çekdar ên ne ser bi hikûmeta Sûriyê ve, yê ku Tirkiye piştgiriya wan dike, êrîşî bakurê-rojhilatê Sûriyê yê di destê kurdan de kirin. Bi behaneyê paqijkirina navçeyê li ser sînorê Tirkiye-Sûriyê ji şervanên Kurd, ên ku Tirkiye wan weke terorîst dibîne. Êrîş piştî birayar rêveberiya Amerîkayê hat bi vekîşandina hêzên xwe, ku ew yek jî weke glopeke kesk hat ji bo

destpêkirina şer ji aliyê Tirkîyê ve. Tevî derbideriyeke berferêh, ev êrîş bû sedema guhertina desthilatdariyên aktîv li ser erdê.

Di 13 Cotmehê de, Meclîsa Sûriya Demokratîk û hikûmeta Sûriyê rêkeftinek bi navbênkariya Rûsyayê îmze kirin, ku rêkeftinê rê vekir ji bo ku hêzên hikûmeta Sûriyê derbasî navçeyên di bin destê Hêzên Sûriya Demokratîk de bibin, ji bo ku alîkariyê bike di rûyê êrîşa Tikriyê de. Di heman demê de, Tirkîyê û grûpên çekdar ên ku piştgiriya wan dike karîna dest deynin li ser parçeyekê ji navçeya sînorî ya ku berê di destê Rêveberiya Xweser a Bakurê-Rojhilatê Sûriye de bû, ew jî di navbera Serê Kaniyê û Girê Spî de. Rêkeftina ku di 22ê Cotmehê de di navbera serokê Tirkîyê Erdogan û serokê Rûsyayê Putin de hat îmzekirin, rê da ku ew navçe di bin destê Tirkîyê de bimîne, herwiha daxwaza vekişandinê ji hêzên bi serkêşiya Kurdan kir. Hikûmeta Sûriyê jî pêgeh û hebûna xwe li gelek navçeyan bihêztir kir.

Heta dema amadekirina vê raporê, ast û qasê kontrola ji aliyê hikûmeta Sûriyê, Tirkîyê, Rêveberiya Xweser û hevpeymanîya bi serêkêşiya Amerîkayê ve li ser navçeyên ku berê di dest DAÎŞê de bûn nediyar bû. Vê yekê jî ji malbatan re zehmet kir ku nas bikin bê ka dê bi kê re biaxivin, û hewldanên başkirina rewşê jî qelstir kirin.

Serbarê bê kê niha deveran kontrol dike, ev pêşveçûn û geşbûn bêdiviyek bilez derkdixe holê da ku desthilatdar di her rêyeke berdest de tevbigerin ji bo naskirina çarenivîsa kesên ku li ser destê DAÎŞê hatine windakirin.

Heta niha, desthilatdarên li ser erdê hewldanên xwecihî derbarê vê pirsê rêk nexistine û organîze nekirine. Li Kobanî, encumena xwecihî komîteyêke taybet bi kesên windayî damezirand, lê li Reqayê endamên encumena xwecihî ya parêzgehê ragihandin ku hêzên îstixbaratê li ser vê dozê kar dikirin. Gelek malbatên ku li kampên derbideran dijîn, xwe gihandin hêzên ewlekarî û îstixbaratê yên Kurdî, ku bi navê Asayîşê tên naskirin, wan hêzan ne berê wan malbatan dan desthilatdarên din û ne jî agahdarî û zaniyariyên li ser dozên wan berhev û tomar kirin. Nebûna pergala an desteyek berpirsyar an jî bingehek hevahengiyê ji bo tomarkirina haletên kesên windayî û şopandina wan di dema bidestxistina zanyariyan de, kir ku ti rê li pêşiya malbatên wan kesan nemîne ji bilî kenalên pêwendîyan ên taybet ligel desthilatdaran û nexweşxaneyên xwecihî, yan jî têkiliyên bi kesên ku gorên bi kom dikolin û navbeynkarên nefermî re. Di gelek haletan de, Hêzên Sûriya Demokratîk an jî Asayîşê bersiva wan malbatên ku dixwestin agahî û zanyariyan bidest bixin nedan. Di hin haletên din de, zaniyariyên ne rast û ne zelal didan, vê yekê jî hişt ku malbat bêzartir bibin. Kesên ku HRW ew dîtî, gotin ku take çavkaniya wan a zaniyariyan an ew girtiyên

berê ne ku kesûkarên wan di girtîgehan de dîtibûn, an jî gotegot û nûçeyên xwecihî yê ne piştrastkirî ne.

Bêhtir ji 20 gorên bi kom, ku bi hezaran term di wan de bûn, li navçeyên ku berê di destê DAÎŞê de bûn hatine dîtin. Li hin navcêyan jî, bi taybetî Reqqa, tîmên xwecihî dest bi derxistina gorên bi kom kirin, lê dahat û piştgiriya pêwîst ji wan re nehatiye peydakirin. Herwiha ew navçe û pêgeh jî li gor pîvan û standardên navdewletî nayên parastin, ev yek jî zîyanê digihîne derfetên malbatan ji bo naskirina hezkiriyên xwe. Di 2018 û 2019an de, HRW hevpeyvîn bi endamên Tîma Yekem a Bersivdanê li Reqayê re kir, ew tîm berpîrsyar e li ser vekirina gorên bi kom û derxisina laş û terman, herwiha HRW çavdêriya protokolên wê tîmê kir di dema dîtina goreke bi kom de li qada el-Reşîd a li Reqayê. Di demekê de ku wê tîmê bi baldarî û hişyarî kar dikir, awayê karkirina wê ya nepêşketî û nebûna tedbîrên yekgirtî, dibin metirsiyek li ser bidestxistina agahiyên girîng ji bo naskirina çarenivîsa kesên windayî. Li deverên di bin destê hikûmeta Sûriyê de, gera malbatan li pey hezkiriyên xwe bêmifa bû, tevî ku hikûmetê bi hezaran endamên DAÎŞê binçav kirin û gelek gorên bi kom jî dîtin. Di navbera kesên ku hêj li hêviya berisvekê ne ji desthilatê, malbatên bi sedên leşkerên artêşa Sûriyê ne.

Endamên wan malbatan ew yek jî anîn ziman ku ew ji şopandina bêmifa ya gotegotan û ji sozên navbênkaran ên cihê gumanê bi mebesta peydakirina zaniyariyan ji bo bidestxistina qasek pere, û ji seredana navendên berê yê binçavkirinê, êdî hêris û aciz bûne. Wan kesên ku hevdîtin ligel berpîrsên Sûrî pêkanîne, gotin ku wan ti zaniyarî bidest nexistin, yan jî guman û texmîn kirin ku DAÎŞê hemû girtiyên li cem xwe kuştine, yan jî berpîrsan gotine ku ew tiştêkî nizanin. Malbatan ji HRW re gotin ku, eger xizmên wan hatibin kuştin jî, ew dixwazin termê wan bi awayekî layiq bi axê bispêrin.

Hevpeymaniya li dijî DAÎŞê ya bi serkêşiya Amerîkayê nikariye pîrsa kesên windayî çareser bike yan jî pêşeng bike. Tevî ku Amerîkayê fînansekirina eşkerekirina gorên bi kom zêde kiriye, û padaşteki diyar kiriye ji bo herkesê ku bikaribe zaniyariyan bide li ser pênc kesayetiyên Sûrî yê oldar ku DAÎŞê ew revandibûn, lê hevpeymaniyê û welatên din ên endam kêm dahat pêşkeşî malbatan kirine ji bo ku bi awayekî bileztir çarenivîsa hezkiriyên xwe bizanin. Hevpeymaniya bi serkêşiya Amerîkayê û Hêzên Sûriya Demokratîk bi hezaran gumanbarên DAÎŞê û endamên malbatên wan girtine, di nav wan de hin berpîrs jî hebûn, dibe ku bersivên van pîrsan li cem wan hebin, lê eger ew zaniyarî û agahî li cem wan hebin jî, dê ew wan ligel malbatan parve nekin.

Rêyeke pêşde

Divê desthilatdarên de-facto yên li bakurê-rojhilatê Sûriyê ligel encumenên sivîl yê xwecihî û hêzên asayîşê desteyeke sivîl pêk bînin, ku şaxên wê yên herêmî û navxweyî hebin, û werin spartin bi erkê berhevkirina zanyariyan, her yek li navçeya xwe, derbarê wan kesên ku di dema desthilatdariya DAÎŞê de winda bûne. Divê ev mîkanîzîm xwedan lîsteyên zanyariyan derbarê kesên windayî de be, di nav de agahiyên pêwendîkirinê bi malbatan re, ji bo ku nûjenkirina zanyariyan hesanîtir bibe, herwiha divê ew deste hevaheng be ligel berpîrsên eşkerekirina gorên bi kom li tevahiya navçeyê, û ligel desthilata îstixbaratê ya berpîrs li ser lêkolîn û lêpîrsîna ligel endamên berê yên DAÎŞê, û ligel wan kesan? jî yên ku mafê gihiştina bi belge û delîlan li cem wan heye. Divê giringîdana vê desteyê li ser danîna pêwendiyê be ligel malbatên kesên windayî li nava Sûriyê û derveyî wê. Ji bo her desthilateke de-facto jî, divê ev desthilat karê hevahengî û veguhestina zanyariyên îstixbaratî bike ligel desteyên li navçeyên din ên di bin kontrolê de, ji bo danîna amara giştî ya kesên windayî. Dema ku mîkanîzmek an jî destyeka wiha were peydakirin, divê desthilatên xwecihî piştgiriya bidin wê desteyê daku karê xwe bi awayekî berfereh bike.

Binçavkirina neçarî ya demdirêj û windakirina bizorê ya bi dehên hezaran kesan ji hêla hemû aliyan ve, bûye nîşanek ji krîza Sûriyê re. Hikûmeta serokê Sûriyê Beşar Esed jî berpîrs e li ser hejmara herî zêde ya van haletên windabûnê. Pîraniya kesên ku ji aliyê hikûmetê ve hatine binçavkirin, bi darê zorê hatine windakirin, ligel redkirina hikûmetê ku ti agahiyên bide malbatan derbarê cih an jî termên hezkiriyên wan de. Ev binpêkirin berdewam in tevî ku hikûmetê beşekî mezin ji axê bidestve aniye. Herwiha hejmareke grûpên çekdar, di nav wan de Ceyş el-Îsalm û Desteya Tehrîr el-Şam, gelek sivîl û şervan revandine û binçav kirine. Li kur derfet hebe, divê desthilatdar û rayedar hewldanên bi vî rengî bikin, ji bo naskirina çarenivîsa kesên ku di destê grûpên çekdar de winda bûne.

Ligel ku kiryarên DAÎŞê bi binçavkirin, girtin û bidarvekirina kesan bi awayekî neyasayî ne bêhempa ne, lê wê ev kiryar bi awayekî berfereh kirine ku digihe asta tawanên li dijî mirovatiyê. Jidestdana axê ji aliyê DAÎŞê ve derfetek baş ji desthilatdarên li Sûriyê re peyda kiriye, ji bo dadgehkirina komên wê grûpê li ser van tawanên û peydakirina bersivan ji malbatan re derbarê çarenivîsa hezkiriyên wan de.

Pêşniyaz

Ji ber berferhebûna kontrola herêmî ya DAÎŞê di dema hêza wê de ji sala 2014an heta 2016/17an û jîdestdana kontrolkirina deverên li bakurê-rojhilatê Sûriyê, Rêxîstina Çavdêriya Mafên Mirovan van pêşniyazan arasteyî hemû desthilatdar û rayedaran dike, yê ku wan navçeyên li Sûriyê kontrol dikin, ku DAÎŞê lê xelk revandibû, ji wan jî Rêveberiya Xweser a Bakurê-Rojhilatê Sûriyê û Hêzên Sûriya Demokratîk yê bi ser ve, hikûmeta Sûriyê, Tirkîyê û grûpên çekdar ên ku piştgiriyê ji Tirkîyê werdigirin.

Em bi dilgiranî amaje bi wê yekê dikin ku hemû aliyan bînpêkirinên tund kirine, mîna girtina neyasayî, windakirina mirovan û îşkencekirina girtiyan û/an serneketin di hevkarîya ligel aliyên navdewletî de yan jî serneketin di dadgehkirina kesên ku bînpêkirin kirine de. Beriya niha HRW pêşniyazên hûr derbarê pêngavên pêwîst ji bo rûbirûbûna bînpêkirinan de, radestî desthilatdar û rayedaran kirine. Ji ber wê yekê, em dê pêngavên pêwîst ên jêrîn pêşkeş bikin ji bo çareserkirina pîrsa kesên ku ji aliyê DAÎŞê ve hatine revandin û malbatên wan bi taybetî, bi hêviya ku bicihkirina van pêşniyazên li jêr derbarê bînpêkirinên girêdayî rêxistina Dewleta Îslamî, dê nimûneyekê peyda bike ji bo çareserkirina bînpêkirinên ku ji hêla aliyên din ve jî hatine kirin.

Pêngavên piştgirîkirina malbatên kesên windayî/girtî ji aliyê DAÎŞê ve bo her desthilateke de-facto

- Destnîşankirina desteyeke navendî yan navendeke hevahengiyê ligel tîmekê li navçeya her desthilatekê, ji bo qeydkirin û tomarkirina haletên windabûnê di dema desthilatdariya DAÎŞê de, û ji bo hevahengiya derbarê berhevkirina agahiyan ligel desthilatdarên din ên li Sûriyê;
- Divê ev deste ango ev xala navendî têkilî û pêwendiyên bike û agahiyên pêwendîkirinê yê nivîsgeh û nûnerên têkildar di nav civakên li navçeyên di bin kontrola xwe de belav bike, di nav wan agahiyan de hejmarên telefonan, e-mail, malper û navnîşanên fîzîkî. Dema ku desteyeka wiha were peyda kirin, Tîma Bersivdayîna Yekem li Reqayê weke nimûne, pêwîst e desthilatdar dahatên madî û teknîkî yê pêwîst pêşkeş wan bikin, daku bi kar û erkên xwe rabin;
- Agahdarîkirina malbatan derbarê çarenivîs, cih û rewşa qanûnî ya hemû kesên binçavkirî, herwiha bersivdana hemû daxwaz û pişîşên girêdayî bidestxistina zaniyariyan ji aliyê malbatan ve;
- Danîna pêwendiyê ligel malbatên li hundur û derveyê Sûriyê, ji bo ku ew zanibin bi kê re têkiliyê deynin derbarê endamên malbatê yê windayî de; û

- Pêşengkirina bidestxistina zanyariyan ji gumanbarên DAÎŞê yê biçavkirî, derbarê kesên ku DAÎŞê ew revandibûn û biçavkiribûn, bêyî bikaranîna karên lêpîrsîna neyasayî wek îşkenceyê û mameleya xirab di dema lêkolînan de.

Pêngavên çareserkirina pîrsa gorên bi kom

- Divê gavên bilez werin avêtin ji bo parastina gorên bi kom, bi pisporiya dadperwerî ya pêwîst ji bo biserxistina vî karî, di nav de rêpêdan bi danasîna terman û parastina delîl û belgeyên ku dê rê li pêş dadgehkirina gumanbarên di nav rêxistina DAÎŞê de veke, ew jî li gor standard û pîvanên dadwerî yê navdewletî; û
- Vexwendina pisporên dadperwer ên navdewletî yê serbixwe, di nav wan de vexwendina kesên xwedî ezmûn li pêş dadgehên tawanên ên navdewletî, ji bo piştgiriyê tîmên navxweyî di parastin û analîzkirina delîl û belgeyan de yê ku li goristanên bi kom ên nû tên dîtin.

Pêngavên tevlîkirina gumanbarên DAÎŞê yê di zîندان de

- Pişkinîna girtiyên di dema guncaw de, ji bo destnîşankirina ku ew berê ji girtiyên DAÎŞê bûn an na;
- Piştrastbûn ku kesên ku berê ji aliyê DAÎŞê ve hatine girtin û kesên din ên biçavkirî rastî destdirêjî û îşkenceyê nayên. Piştrastbûn ku şertûmercên biçavkirinê li gorî standard û pîvanên navdewletî yê binaçavkirinê ne, di nav de rênîma û rêzikên Mandela.
- Rêpêdana giştî û bêyî astengî ji destyên çavdêriyê yê serbixwe û destpak re, mîna Komîteya Lêkolînê ya Neteweyên Yekbûyî ya taybet bi Komara Erebî ya Sûriyê û Komîteya Havdewletî ya Heyva Sor a (ICRC), da bigihin hemû navendên biçavkirinê; û
- Nabe kesên ku berê ji aliyê DAÎŞê ve hatibûn biçavkirin yan kesên din ên di zîndanê de, ji bo wan welatan werin veguhestin, ku berê tên naskirin bi îşkencekirinê û mameleya xirab bi kesên biçavkirî re.

Pêngavên ji bo pêkanîna dadweriyê derbarê tawanên ku DAÎŞê kirine

- Amajeyên dilgiranîyê û nerehetiyê berdewam li cem Rêxistina Çavdêriya Mafê Mirovan hene, derbarê karîna desthilatdarên ku navçeyên berê yê DAÎŞê kontrol dikin, di warê garantîkirina peydakirina dadgehên dadperwer û tedbîrên yasayî û xalên din ên parastina mafên mirovan. Lewma HRW bang li desthilatdarên li ser erdê dike ku sîstema xwe ya dadweriyê sererast bikin da li

gor pîvan û standardên navdewletî bin, ew jî li gorî pêşniyazên hûr ên ku di raporên berê de hatibûn xuyakirin.

- Rêxistina Çavdêriya Mafê Mirovan bang li desthilatên de-facto dike ku bi awayekî giştî hevkarîyê bikin ligel Mîkanîzma Navdewletî ya Bêalî û Serbixwe (IIM) ya taybet bi Sûriyê, ku li gorî birayara 71/248 a Konseya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî hatiye saz kirin, û hevkarîyê ligel karbidestên dadwerî yê xwecihî li deverên din bike- ku xwedan desthilateke dadwerî ya navdewletî ne ji bo lêpîrsîn û dadgehkirinên derbarê tawanên mezin ên ku li Sûriyê hatine kirin de, di nav de tawana windabûna bi zorê ya ji aliyê endamên DAÎŞê ve hatiye kirin.

Jo bo hevpeymanîya navdewletî ya li dijî DAÎŞê

- Peydakirina alîkariya darayî û teknîkî û avakirina karînan li cem desthilatên xwecihî, yê destê wan di tawanên mezin û binpêkirinên mafên mirovan de nîne, ji bo belgekirin û şopandina çarenivîsa kesên ku li bakurê-rojhilatê Sûriyê winda bûne;
- Bangkirin li Neteweyên Yekbûyî û aliyên din ên navdewletî yê çalak ji bo misogerkirina peydakirina vê alîkarî û rahênanê ji bo vê şopandin û belgekirinê, di çarçoveyê mafên mirovan a ne cudakar de;
- Pêşengkirina bidestxistina agahiyan ji gumanbarên DAÎŞê yê girtî li cem hevpeymaniyê, derbarê wan kesên revandî û girtî de li cem DAÎŞê;
- Pişkinîna girtiyên di dema guncaw de, ji bo destnîşankirina ku ew berê ji girtiyê DAÎŞê bûn an na; û
- Nabe ku ti kes ji kesên di zindanan hevpeymaniyê de, ji bo wan welatan werin veguhestin, ku berê tînan nas kirin bi îşkencekirin û mameleya xirab bi kesên binçavkirî re.

Ji bo Amerîkayê

- Divê Wezareta Bergiriyê û Hevpeymanîya Navdewletî ya bi serkêşîya Amerîkayê piştrast bibe ku eşkerekirina çarenivîsa kesên windayî xaleke sereke ye di stratejiya piştî DAÎŞê de, û daxwaza fînansekirin û karmendên pêwîst bike ji bo hesanîkirina vî karî;
- Di dema amadekirina her stratejiyekê bo qonaxa piştî DAÎŞê de, divê Wezareta Derve piştrast bibe ku eşkerekirina çarenivîsa kesên windayî xaleke sereke ye, û daxwaza fînansekirin û karmendên pêwîst bike ji bo hesanîkirina vî karî. Divê Wezareta Derve berdewam be li ser pêşkeşkirina piştgiriya diravî ji civaka sîvil a Sûrî re ji bo bilez kirina eşkerekirin û parastina gorên bi kom, di nav de pêdana pereyan ji bo avakirina karînan tîmên navxweyî yê li ser erdê, ligel

piştgirîkirina bilez a di warê peydakirina alav û amûrên alîkar di kolandina gorên bi kom de; û

- Divê Kongres piştrast bibe ku pirsê eşkerekirina çarenivîsa kesên ku li jêr desthilata DAÎŞê wînda bûne xaleke sereke di her stratejiyeke qonaxa piştî DAÎŞê de ye, û ji bo eşkerekirina çarenivîsa kesên ku ji aliyên DAÎŞê ve hatine revandin, kordînatorekî berpirs diyar bike. Kesekî wisa dê were erkdarkirin ku pêwendiyê bi Wezareta Derve, Wezareta Bergiriyê û Hevpeymaniya Navdewletî re bike, ji bo destnîşankirina agahiyên derberê kesên ku ji aliyê DAÎŞê ve hatine revandin û gihandina van agahiyan bo malbatan û aliyên din ên ku li van agahiyan digerin.

ⁱ Di dema amadekirina vê raporê de, her yek ji Tirkiyê û grûpên ku piştgiriyê jê wêrdigrin, Rêveberiya Xweser ya bi serkêşiya Kurdan û Hêzên Sûriyeya Demokratîk, hikûmeta Sûriyê li xwe digire. Hebûna polîsên leşkerî yên Rûsî jî li navçeyê heye.